



DİYARBAKIR SİYASAL VE SOSYAL
ARAŐTIRMALAR ENSTİTÜSÜ

ENSTİTUYA DİYARBEKİRÊ BO
LÊKOLİNÊN SIYASÎ Û CIVAKÎ

DİYARBAKIR INSTITUTE FOR POLITICAL
AND SOCIAL RESEARCH

MODELÊN PERWERDEYA ZIMAN Û MÎNAKÊN CÎHANÊ

2

RÊZEBELAVOKÊN BERÎ HER TIŐTÎ ZIMANÊ DAYIKÊ



Kurt İsmail Paşa
2. Sokak
Güneş Plaza No:18
21100 Yenişehir
Diyarbakır
Türkiye
T: +90 412 228 14 42
F: +90 412 224 14 42
www.disa.org.tr
info@disa.org.tr



**DİYARBAKIR SİYASAL VE SOSYAL
ARAŞTIRMALAR ENSTİTÜSÜ**

**ENSTİTUYA DIYARBEKİRÊ BO
LÊKOLİNÊN SİYASÎ Û CIVAKÎ**

**DİYARBAKIR INSTITUTE FOR POLITICAL
AND SOCIAL RESEARCH**

**BERÎ HER TIŞTÎ ZIMANÊ DAYİKÊ
WEŞANÊN DÎSAYÊ**

ISBN: 978-605-5458-04-1

Belavoka Berî Her Tiştî Zimanê Dayikê perçeyêke projeya salane ya Bilindkirina Hişmendiyê derheqê Zimanê Dayikê û Duzimanî di Perwerdeyê de ye ku ji şeş hejmaran pêk tê ku bi destê Enstîtuya Diyarbekirê bo Lêkolînên Siyasî (DiSA) tê birêvebirin. Di van belavokan de derheqê mijarên wek têkiliya perwerdehî û zimanê dayikê, cihê perwerdeya ser esasa zimanê dayikê di xelaskirina newekheviyan de, cihê zimanê dayikê di jiyana civakî, kulturî û siyasi de agahiyên kêrhatî pêşkêşî gel bike. Hûn dikarin belavoka dumehî li ser malpera www.disa.org.tr peyda bikin.

Nivîsarên di vê belavoka me ya duym de cih digirin ji xebata bi nave Insights Education ku ji aliyê Zanîngeha Sussexê Enstîtuya Lêkolînên Pêşdebirinê hatine girtin û wergerandin bo kurmancî û tirkî. Wergêrên kurmancî û tirkî bi destê Şerif Derince hatine kirin, di tirkîkirina wan de keda Yasemin Cansuzê, kurmancîkirina wan de jî ya Ergin Öpenginî gelek girîng in. Her wiha endamên DiSAyê jî di naveroka nivîsaran de tevkarîyên heja kirine. Ji aliyê rupelsazî û bergsaziyê de jî em gelek spas dikin Emre Senan. Em spas dikin Veysel Aydeniz bo fotografên wî.

Ji kerema xwe herin rupela www.disa.org.tr/berihertistizimanedayikez.pdf an jî me agahdar bikin ji bo ku belavoka me bi dest bixin. Ji bo inglîziya nivîsaran binêrin: www.id21.org/insights/insights-edo5/index.html

Çap: Ege Basım Matbaa ve Reklam Sanatları

Copyright © Xezîran 2011

Belavoka Berî Her Tiştî Zimanê Dayikê wek gavekê projeya Enstîtuya Diyarbekirê bo Lêkolînên Siyasî û Civakî (DiSA) ya bi navê Bilindkirina Hişmendiyê derheqê Zimanê Dayikê û Duzimanî di Perwerdeyê de ku piştgiriya fona Matra'yê ya Balyozxaneyê Holandê wergirtiye di bin berpîrsiyariya Şerif Derince de hatiye amadekirin. Dibe ku fikr û dîtinên di belavokê de cih digirin yek bi yek bi yê DiSA û Balyozxaneyê Holandê jî hev negirin. Ti astengî û rêgirtin tune li ber zêdekirin û belavkirina belavokê de tenê heke çavkanî bête destnîşankirin bi awayeke ron û zel.

Bi arîkariya



Kingdom of the Netherlands

**MODELÊN PERWERDEYA
ZIMAN Û MÎNAKÊN CÎHANÊ**



Bikaranîna Zimanê Dayikê di Perwerdeyê de û Modelên Tê Bikaranîn

Derheqê mijara perwerdeya duzimanî an jî ya pirzimanî de, mirov dikare behsa qederek modelan bike ku bi navên cuda cuda tên zanîn. Hinek van modelan de, zimanê dayikê tenê di dema derbasbûna perwerdeya bi zimanê duyem de tê bikaranîn (modela derbaskirinê); hinekan de jî mebest ev e ku zimanê nû bê hînbûn, derûdoreke pirzimanî geş bibe û bê parastin bi handan û arîkariya zimanê dayikê (modela parastin û domandinê). Bi gîştî modelên wek “derbaskirinê” zêdetir hewl didin ku bi navê entegrasyonê xwejbîrkin (asîmilasyon) pêk were; yê wê wek “parastin û domandinê” jî didin ber xwe ku pirzimanîyeke tekmîl geş bibe. Derheqê sepandin û encamên van modelan de, lêkolînên curbecur hatine birêvebirin li qederek herêmên seranserê cîhanê. Van lêkolînan cih çêkîrîne ku em armanc û rojevên veşartî yê modelên perwerdeya ziman baştir fehm bikin û her wiha tê bigehin ka ev model li ser kîjan bawerî û qebûlên sebare hînbûn û hînkirina zimanan hatine duristkirin. Wekî din, bi saya wan modelan, encamên ku hatine armanckirin rontir û zelaltir bûne. Bo nîmûne, perwerdeya bi zimanê serdest her wext rû nedaye ku ev zimanê serdest baştir bê hînbûn; bi heman şiklî her modela bi navê perwerdeya duzimanî bi rastî jî duzimanîyek pêk neaniye. Ji rexeke din ve, senifandina modelên perwerdeya ziman ên curbecur ku seranserê cîhanê tên bikaranîn nîşan dane ku perwerdeya ziman de tenê yekî rast an jî xelet tune; beravajî vê yekê modelên curbecur dibin tixmetixm li gor taybetî û rastiyên herêman.

Modelên Tê Bikaranîn di Perwerdeya Ziman de

1. Modela Yekzimanîkirinê/Xeniqandinê: Ev modela ku bi inglîzî wek “submersion” tê binavkirin, Tirkiye jî nav de, di gelek welatên ku mufredatên xwe li gor prensîb û pratîkên tesîra wan herî xeternak ji aliyên ziman û perwerdeyê de tên sepandin. Di vê modela ku ast û kalîteya perwerdeyê wê gelek kêmtir e, tenê bi zimanê serdest perwerde didin. Ji bilî zimanê serdest, zimanên din ên wî welatî tên piştguhkirin, tenê zimanên xweyî prestîj ên Rojava wek zimanê duyem tên hînkirin. Wek encama vê modelê, li cihên ku zimanê dayikê nikare bê parastin ji ber sedemên curbecur, gelên xweyî zimanên bindest gelek zehmetiyên dikêşin di raguhastina zimanên xwe de û bi vî rengî hingî diçe yekzimanîyek rû dide di zimanê serdest de. Bi gotineke din, zimanê dayikê tê xeniqandin. Sedema esas a wundabûna zimanên ji xeynî tirkî ji destpêka dîroka Komara Tirkiyeyê heta niha ev yek e.

2. Modela Derbaskirinê: Ev model zêdetir li cihên ku xwendekarên ji malbatên bindest û kêmtir perwerde digirin tê bikaranîn ku li van deran rêjeya dewamkirina dibistanê û serketina di dersan de gelek kêmtir e nav xwendekaran de. Bi bikaranîna vê modelê armanc ev e ku xwendekar bikarin zûtir û rihettir derbasî xwendin-nivîsandinê bibin û dewamkirina

dibistanê zêdetir bibe. Di vê modelê de, xwendekar di destpêka dibistanê de yek-du salan bi zimanê xwe yê dayikê perwerde digirin, lê piştî wî bi lez û bez, beyî ku rolekê bidin zimanê dayikê, xwendekar mecbûri derbasî perwerdeya bi zimanê duyem, yanî zimanê serdest, dibin. Mînakê herî navdar li cîhanê rewşa zarokên ji malbatên Latîn (Hîspanîk) ên li Amerîkayê ne ku ewil bi îspanyolî dest bi xwendin-nivîsandinê dikin û piştî yek-du salan derbasî perwerdeya bi tenê inglîzî dibin. Li gor piraniya lêkolîner û bîsporan, sereke armanca vê modelê ev e ku xwejbîrkirin (asîmîlasyon) leztir çêbe bin navê entegrasyonê de; lewma derbasbûna xwendin-nivîsandinê hêsantir jî be li gor modela ku yekser bi zimanê serdest dest bi perwerdeyê dike, newekhevî û cudakariyên di nav perwerdeyê de nayên xelaskirin, hînbûn û parastina zimanê dayikê çak pêk nayê; her wiha zehmetî û kêşe dewam dikin di hînbûna zimanê duyem de jî.

3. Modela Parastin-Domandinê: Di vê modela ku ji bo perwerdeya xwendekarên ji zimanên bindest tê bikaranîn de, herî kêm ji 6 heta 8 sala perwerdeyê ser esasê zimanê dayikê an jî yeke pîrzimanî tê danan, zimanê(n) serdest hêdî hêdî dibê perçeyekê perwerdeyê û piştî demekê dibê zimanê hînkirina hinek dersan. Taybetî li Efrîqeya Başûr, Bolîvya, hinek herêmên Hîndîstanê û Etiyopya'yê mînakên serketî ên vê modelê hene. Hin dibistanên li Welatê Baskî û Katalunyayê jî dibin nimûneyên vê modelê. Lêkolîn û amar (îstatîstîk) nîşan didin ku dibistanên bi vê modelê perwerdeyê didin encamên gelek muspet û serketîtir didin bi qiyasî modela derbaskirinê.

4. Modela Duzimanîkirinê/Herikandinê: Ev modela ku bi inglîzî wek “submersion” tê binavkirin, zêdetir wek perwerdeya bo zarokên ji malbatên çîna navîn, yanî yên dewlemend, tîn zanîn. Di vê modela ku hem ji aliyê qelîteya perwerdê hem jî ji aliyê geşbûna pîrzimaniyê encamên gelek serketî didin, hem zimanê xwendekaran hem jî ya ku dixwazin hîni wan bikin xweyî prestîj û statûyêke bilind in û piranî piştgîriyêke xurt digirin ji civakê. Xwendekar ne bi zimanê xwe yî dayikê, lê bi zimanekî duyem dest bi perwerdeyê dikin; lê belê mamoste her du zimanan jî baş dizanin û gelek qîmet û rêzê didin zimanê xwendekaran ê dayikê. Mînakên herî navdeng yên vê modelê, bernameyên duzimanîkirinê ne di frensî û inglîzî de li Qenedayê. Lê belê, heke modeleke bi wî rengî li herêmeke bê bikaranîn ku ji aliyê aborî destnexweş, ango feqîr, û cihên ku cudahiyan girîng ên statû û prestîjê hebin navbeyna zimanan de, bi ihtîmaleke mezîn dê encam bişibe modela xeniqandinê, yanî yekzimanîkirinê. Ji ber ku di rewşeke wisa de zimanê ku ji mêj ve hemberî pêkutiyên maye, yanî zimanê zarokan ê dayikê, piranî hem ji aliyê mamosteyan hem jî ji aliyê mufredatê tî piştguhkirin û ev ziman hingî diçe ber bi wundabûnê diherike. Bi wî şiklî di pratîkê de modela ku me wek yekzimanîkirinê-xeniqandinê binavkiribû tê sepandin.

5. Modela Du-Berî: Ev model hem ji aliyê pêşveçûna akademîk hem jî ji aliyê duzimaniyê ve encamên gelek baş dide. Li dibistanên ku bi vê modelê perwerde didin, xwendekarên xweyî zimanekî kêmîneyî û yên ji zimanên serdest bi hev re di heman sinifan de beşdarî dersan dibin; perwerde li gor pêdivî û taybetiyên xwendekaran, piranî nîvenîv bi her du zimanan tê sepandin; lê belê heke zimanê kêmîneyî di salên derbasbûyî de hatibe bêquwetkirin û armanc ev be ku dîsa bê bihêzkirin, zêdetir giranî didin zimanê kêmîneyî û dibê ku



perwerde heta rêjeya %90 bi zimanê kêmnîneyî be. Ji ber ku zimanê serdest jixwe xweyî prestîj e û li derveyî dibistanê têra xwe piştgirî digire, ti rêyek din tine ku neyê hînbûn an jî kêm bê hînbûn. Li gor lêkolîner û bisporan dibistanên ku heta rêjeya %90 ser esasê zimanê dayikê perwerde dide dibin wek modela parastin-domandinê ji bo xwendekarên ji zimanên bindest; her wiha ji bo xwendekarên ji zimanê serdest jî rê çêdike bo duzimanîkirineke rêk û pêk. Di astengiya herî girîng di vê modelê de ev e ku xwendekarên ji zimanên serdest zêde ji dil nabin ku beşdarî van dibistanan bibin. Taybetî li gewrebajaran (metropol) sepandina wan zehmettir e, bes mînak hene ku li bajarên piçûktir û navçeyên ku têkiliyên rojane û yên danûstendîne bi gelek zimanan tên danan, modelên bi vî şiklî bîn birêxistin û encamên serketî derxînin. Bo nimûne, li Amerîkayê di hin dibistanan de, zarokên ku zimanê wan ê dayikê îspanyolî ye ders digirin ligel zarokên inglîzî-axêv ji mamosteyên duzimanî, û her du ziman jî bi rihetî tên bikaranîn.

Helbet nabe ku yek ji van modelên jorê hatine îzahkirin bi rihetî û hêsanî bê hîljartî û li herêmeke bê bikaranîn beyî ku bi berfirehî li ser nîqaş bîn kirin. Bi heman şiklî, ne mecbûrî ye ku tenê yek ji van modelan bê bikaranîn. Bereqş, mirov dikare bêje di heman herême de modelên ji hev cuda divê bîn birêxistin. Lê ya mûhîm ev ku divê perwerde bi gîştî ligel hemû şîrîkên wê ji aliyên zimanî, civakî-aborî û lojîstîkî (wek mamoste û çavkaniyên materyalî) baş bê zanîn û bernameyên perwerdeyê li gor vana bîn duristkirin. Ji rexê din, wexta modeleke perwerdeyê li herêmeke bê bikaranîn, nayê vê maneyê ku divê ev model heta hetayê wisa dewam bike. Li gor pêdiviyên û guherînên dû re derdikevin guherîn û lêanîn her gav mimkun in û heta dikarin yekcar vê modelê betal bikin û yeke din durist bikin an jî derbasî yeke din bibin.

Pirsgirêkên Derheqê Modelên Perwerdeya Ziman

Wekî ku gelek lêkolîn bi rengê ron û zelal nîşan didin, modelên mîna yekzimanîkirin/xeniqandinê û yên derbaskirinê hem di maweya kurt û hem jî ya dirêj de pirsgirêkên zimanî û civakî derdixin. Bikaranîna modelên wisa li ber bicihkirina wekhevîyê û xelaskirina zerar û ziyanan di perwerdeyê de astengiyên mezin pêk tînin. Lewma, divê modela yekzimanîkirinê ku ji destpêka Komara Tirkîyeyê heta niha tê bikaranîn tavilê were betalkirin; şuna wê, modeleke derbaskirinê neyê bikaranîn, berevajî wê divê modelên wek parastin-domandinê an jî du-berî yên ku li ser esas zimanê dayikê perwerde didin bîn bikaranîn.

Lê dîsa jî divê mirov bibêje ku modelên li jorê hatin îzahkirin ji hinek kêmasî û pirsgirêkan rizgar nînin. Her çiqas hin zêdeyên hinekî ji van modelan hebin jî, wexta polîtîkayên perwerdeyê duzimanî wek regez (prensîp) bîn qebûl kirin jî, pirsgirêka esil sepandina van regezan e. Her yek ji van modelan di nav xwe de dibin cure cure û her wiha pratîkên cuda rê didin ku li herêmên cuda encamên cuda derkevin di bikaranîna heman modelê de. Wekî din, modeleke ku li gor taybetî û pêdiviyên herêmeke hatiye duristkirin dibe ku li herêmeke ku xweyî heman armancan e encamên cuda bide. Pirsgirêkeke din jî ev e ku wexta ev model bîn duristkirin û sepandin, wisa tê ferzkirin ku xwendekar tenê yekzimanî ne, bi gotineke din an tenê zimanê xwe yê dayikê xeber didin an jî zimanê serdest. Lewma nayê dîtin û fehmkirin ku ev xwendekar gelek caran rastî gelek zimanan tên di jiyandê xwe yên rojane de. Bes, zêdebûn û lezbûna rê û rêçîkên danûstendin û çûnhatinê taybetî

van salên dumahîkê de, rewşeke ji her wextê durehtir (hîbrîd) derxistiye ji kinarên zimanî û nasnameyî ve. Mirov nikare bibêje ku ev model dikarin bibin bersiv ji bo durehiyêke vî rengî. Li Tirkiyeyê, piraniya xwendekarên ku zimanê wan ê dayikê ne tirkî ye jixwe zimanê xwe yê dayikê, tirkî wek zimanê duyem û li hin herêman jî zimanekî sêyem an çarem bikar tînin di jiyana rojane de berî ku dest bi dibistanê bikin. Bo nimûne, gelek zarokên ku zimanê wan ê dayikê kirmancî/zazakî ye an jî zarokên erebî-axêv ên li şehrên Kurdistanê dijîn herî kêr sê zimanan seh dikin û dikarin van bikarbînin ji bo pêdiviyên xwe yên cuda cuda berî ku gav biavêjin dibistanê.

Ji rexê din, modelên ku dê bèn bikaranîn di merhaleyên cuda yên perwerdeya ziman de divê hevaheng bin li gel ezmûnên ku dê piştî her merhaleyê ferz be li ser xwendekaran. Wexta hemû perwerdeya seretayî (ji 6 heta 8 salên destpêkê) hemû bi zimanê dayikê were birêxistin û wan salan de pêşveçûn û serketinên girîng bèn bidestxistin jî, heke dibistanên ku piştî wan salan tenê bi zimanê serdest perwerdeyê bidin an jî heke ezmûnên navendî yên ku sertesarê (hemû derê) wî welatî tenê bi zimanê serdest bèn birêvebirin, dê û bavên bi zimanên kêrnîyê diaxivin, dê ihtimaleke zêde zarokên xwe neşînin dibistanên pîrzimanî ên ku ser esasa zimanê dayikê perwerdeyê didin. Jixwe birêvebirina ezmûnên navendî têra xwe pîrsgirêkan derdixe, lê wexta ezmûnên navendî mecbûrî bin jî, vêga lazim e ev ezmûn pîrzimanî bèn amadekirin.

Ji ber van pîrsgirêkan, piraniya modelên perwerdeya ziman li gelek welatan bi gelek xeletiyên tîn sepandin; ihtimala wan a serketinê neçûye ser ji ber kêmasiyên din; û her wiha ji bo berjevendiyan siyasî hatine manîplekirin.

Lewma ji xeynî nîqaşên li ser modelên cuda cuda yên perwerdeya ziman, divê qaîdeyên hînbûn û hînkirina zimanan baştir bèn îzahkirin û belavkirin ji bo ku çêtir bèn fehmkirin ji aliyê kesên wek mamoste, dê û bav, bisporên mufredatên perwerdeyê û xwendekaran ku pêwendîdarê vê meselê ne. Bi saya hewl û cehdeke wisa şert û mercên her xelkê li her herêmekê dê baştir bèn zanîn; armancên ku divê bèn bidestxistin û rê û rêçîkên bidestxistina van armancan dê çêtir bèn destnîşankirin. Hinek xebatên ku divê di vê wextê de bèn birêvebirin ev in:

- Tespîtkirina qebiliyetên zimanî yên zarekî û nivîskî yên xwendekar, dê û bav û mamosteyan,
- Lêkolîna seh û meylên derheqê zimanan de bi awayekî berfirehî,
- Bilindkirina hişmendiyekê derheqê hînbûn û hînkirina zimanan de,
- Tespîtkirina daxwazên civakî û takekesî bi beşdarên ji her rengî,
- Çespandina armancên perwerdeyê û zimanî,
- Nîrxandineke ron û zelal a çavkaniyên heyî yên kes, materyal û pereyî,
- Tespîtkirina gavên ku dê bèn avêtin di demeke nêz, navîn û dirêj de ji bo ku armancên destnîşankirî bèn bidestxistin,
- Amadekirina modelan ji bo ku armancên destnîşankirî bèn bidestxistin bi şerta tim bèn çavderîkirin û rastkirin,
- Sepandina qedemeyên plankirineke çerxî (tr:döngüsel, in:cyclical), tetbîqeke ceribandîne, nîrxandin, pîvandî û tehlîlîkirinê.



Tenê piştî ev gav bên avetin mirov dikare modelên cuda yên perwerdeya ziman amade bikin ku ev model bikarin bibin bersiv ji bo pêdiviyên curbecur.

Vê Belavokê de

Di vê belavokê de hûn ê çend nivîsaran bixwînin ku ji lêkolînên derheqê modelên perwerdeya ziman yên hinek welatan hatine deranîn. Nivîsara Aikman ser jinûve geşkirina zimanên binkî ye û bal dikişîne ser girîngiya bikaranîna zimanê dayikê di perwerdeyê de ji bo jinûve geşkirinê. Bi heman şiklî, Albó jî modela Perwerdeya Duzimanî û Navkultûrî ku li Bolîvyayê bi awayekî serketî tê bikaranîn destnîşan dike. Malone, modelên ku bi zimanê dayikê dest pê dikin û paşî zimanê serdest li gor hin merhaleyan lê zêde dibin şîrove dike bi çend tabloyên kardayî. Heugh jî çend lêkolînên li Efrîqayê hatine birêvebirin dide berhev û dibêje ku her çiqas hinek sûdên kurtedemî jê bên girtin jî di modela derbaskirinê de serketinên bidestketî ji sala pêncê pê ve ji dest diçin. Di nivîsara dumahikê de, Jhingran û Miller derheqê modelên perwerdeya pîrzimanî li Hîndîstanê agahiyên kêrhatî didin; lê dibêjin wexta mafên qanûnî bê danan jî di sepandinê de pirsgrêk dewam dikin.

Şerîf Derince – Enstîtûya Diyarbekirê bo Lêkolînên Siyasî û Ciwakî

Jinûve Geşkirina Zimanên Binkî

Ji 30 salên buhurî vir ve birrek bernamêyên perwerdeyê bişkiftin, hem ji bo xelkên binkî hem jî bi destê wan bi xwe. Li cihên ku bernamêyên duzimanî û navkultûrî an jî pîrkultûrî hatin danan bo xelkên binkî, xwendekarên binkî şiyaneke zêdetir bi dest xistin û bêtir dewam kirin xwendina xwe.

Ji bo xelkên binkî, hewlên bo jinûve geşkirina zimanên wan venaqete ji têkoşîna wan a bo demokrasî, maf û xweseriyê. Kiryarên wan rê da Pêşnumaya Danezana Derheqê Mafên Xelkên Binkî ya 1993'an ku rê da daxwazên qanûnî û siyasî yên xelkên binkî ji bo damezirandin û birêvebirina perwerdeyê bi zimanên xwe (xal 15).

Divê perwerdeya bo kêmîneyên etnîk û binkî guncaw be û zanyarî û zimanên wan qebûl bike. Bernamêyên perwerdeya pîrzimanî û pîrkultûrî divê li ser bingeha fehmkirina pratîkên zimanî ên xelkê bên danan, û li rexê din jî bihêlin ku perwerde piştgirî bide hînbûn û bikaranîna zimanên serdest jî di şert û mercên îro de.

Heke perwerdeya duzimanî kurtedemî be mebesta bikaranîna wê tenê ew be ku xwendekar

rihettir derbas bibin zimanê serdest û paşî bibin yekzimanî di wî zimanî de, ew yek perisîn û pêşveçûna zimanê binkî û kapasîteya rewşenbîrî û çavkaniyên civakî û kultûrî yên axêverên vî zimanî bin pê dike.

Xelkên binkî wek hemû miletên din di nav cemaetên guherbar û pîrzimanî de dijîn û pêwendîya têkel a navbeyna nasnameya etnîk û zimanî dijwariyek e bo birêxistan perwerdê. Li cihên ku xelkên binkî ji yekî zêdetir zimanan bi kar tînin, modela ‘cihbûyî’ (zimanê binkî wek zimanê yekem û zimanê serdest wek zimanê duyem) divê bi rengêkî ciddî bibe babeta fikar û rexneyan. Awayekî kêrhatîtir ew e ku wek ‘perwerdeya navkultûrî’ tê binavkirin li Emerîkaya Latîn. Her çiqas di serî de sînorkirî bû bi perwerde û hînbûna zimanan bo xelkên binkî, perwerdeya navkultûrî niha temsîla ferasetêke civakî ya nû dike ku qîmetê dide pirçeşniyê û vê datîne navenda perwerdeyê bo hemû xwendekaran. Her wiha, beşdariya cemaetî û malbatî dabîn dike ku zimanên binkî perwerde û civakê geştir û qewîtir bikin.

Li rexê din, bêyî beşdariyê lihevkerin pêk nayê. Li Peruyê, kolejên Amazonan, birêvebirina navkultûrî ya Wezaretê Perwerdeyê rexne dikin bi doza ku nikare çareseriyên peyda bike bo pêwendiyên têkel û lap (têra xwe) sîyasî di navbeyna têgîhiştinên edetî yên kultûrî û zimanî de li Peruyê. Ji bo ku ew dijwarî bêne çareserkirin, divê pirçeşnî bibe zereka (navenda) polîtîka û plankirina zimanan.

Pratikên berketî dêhna xwe didin terza ku xelk zimanên xwe bi kar tînin ji bo ku hev du fehm bikin di danûstandinên xwe yên rojane de, ne ku dasepandina polîtîkayên zimanî yên ser esasê rayeke (nêrîneke) peytandî û şeweparêz a ziman û kultûrên binkî.

Sheila Aikman

Her wiha lê binêrin: 'Indigenous Education: Addressing Current Issues and developments' by Stephen Kay and Sheila Aikman in Comparative Education, Vol 39,2, 2003 (û gotarên din).



Şoreşa Perwerdeya Duzimanî li Bolîvyayê

Perwerdeya Navkultûrî û Duzimanî piştgirî dide mafên zarokên binkî yên diçin dibistanê ku di zimanên xwe de perwerde digirin.

Em dikarin fêrî çî bibin ji Bolîvyayê ku xweyî yek ji mezintirîn serhejmara xelkên binkî ye li Emerîkaya Latîn û xwendekar bi zimanên xwe yên dayikê perwerde digirin?

Nêzîkî ji sêyan du behrê bolîvyayî ji komelgeyên binkî ne, ku mezintirînên wan Quechua û Aymara ne. Heta 1982'an, zarok dihatin kutekkirin di dibistanê de ji bo ku bi zimanên xwe diaxiftin şûna îspanyolî. Lewre komelgeyên binkî piraniya edetên xwe yên zimanî û kultûrî wunda kirin.

Perwerdeya berketîtir

Perwerdeya Navkultûrî û Duzimanî li Bolîvyayê dide ber xwe ku bi kêmî bi zimanên binkî yên sereke wekî Quechua, Aymara û Guaranî perwerde bide. Her wiha hewl dide ku perwerdeyê û pêvajoyên hîndekariyê pêş bixe di zimanên binkî û îspanyolî de.

Perwerdeya navkultûrî û duzimanî bixwebaweriyê zêdetir dike, dihêle ku zarok dilşad û bextiyar bibin, xwe bi dilê xwe derbibirin, zêdetir tevlî danûstandinên civakî bibin, xewl û xeyalên xwe binexşînin û par bikin û afirîner bin. Ji sala 1994'an ve, wexta ku Qanûna Reforma Perwerdeyê, perwerdeya navkultûrî û duzimanî li 30 zimanên din ên kêmîneyî fireh kirin, çardeh elifbeyên din ên binkî hatin standartkirin û hînkirin di dibistanan de.

Muqayeseyeke dibistanên bi mifredata perwerdeya navkultûrî û duzimanî perwerdeyê bi rê ve dibin û yên ser esasên mifredatên edetî û kevn diçin dest nîşan dike ku xwendekarên ku bi perwerdeya navkultûrî û duzimanî perwerde digirin kêmîtir sinifê dubare dikin. Her wiha, rista xweşhaliya şiyana perwerdeyê bo zarokên binkî zêdetir bûye.

Parastina nasnameya kultûrî

Bicîhkirina zimanên binkî li zereka perwerdeyê ewleyî û azadiyê dabîn dike bo zarokên binkî ku encamên çêtir bi dest bixin, û di heman demê de nîrx û pratîkên kultûrî yên civakên xwe biparêzin. Her wiha, bikaranîna zimanên binkî di xwendin û nivîsandinê de seh û meyla şanazî û pêbaweriyê dide cemaetan ku ew yek jî rê dide reftarên girîng ji bo beşdarbûnê li civaka firehtir a li welatekî.

Palpişt û çavdêriyên bidestketî nîşan dikin ku:

Serhatiyên welatên cîran yê xweyî heman xelkên binkî ne girîng in:

- Perwerdekarên li Puno, Perû hatine perwerdekirin bûne sepînerên girîng ên reformê ku ji bisporên Perûyî handan û piştgiriyeke qewî girtine.
- Gihandina mamosteyan gelek girîng e: gelek berketîtir e ku mamosteyên nû bêne gihandin li şûna ku yê hînî metodên edetî bûne bêne perwerdekirin. Kêmbûna mamosteyên xweyî wesfên navkultûrî û duzimanî û serhişkiya mamosteyên îspanyolî-axêv ji bo ku xwe guncaw bikin bo hîndariyên nû û materyalên hîndekariyê bûne astengiyên sereke.
- UNICEF û saziyên din ên navneteweyî gelek karîger bûne di erêkirina perwerdeya navkultûrî û duzimanî wek polîtîkaya fermî û bicihanîna wan polîtîkayan di pratîkê de. Ji bo serketinên din di paşerojê de divê:

- pêwendiyên qewîtir çêbin di navbeyna Wezareta Perwerdeyê û ew kesên ku berpirsiyar in di bicihanîna pêdiviyên mehelî û dibistanên seretayî yê herêmî,
- zêdetir materyalên nivîskî bi zimanên binkî bêne duristkirin, edebiyata devkî, werger ji îspanyolî û zimanên din jî di nav de,
- perwerdeya navkultûrî û duzimanî berbelavtir be bo zorîneyên îspanyolî-axêv, ku bi qanûnan hatiye destnîşankirin lê hêj jî nehatiye bicihanîna di pratîkê de,
- zêdetir çavkanî bêne terxankirin bo gihandina mamosteyan ji bo pêşxistin û bikaranîna rê û rêzikên duzimanî,
- stratejî bêne danan ji bo pîvîna wekhevî û afirîneriya navkultûrî û duzimanî, her wiha seh û meylên cemaetên binkî,
- perwerdeya navkultûrî û duzimanî bête bihêzkirin wek polîtîkaya fermî ya dewletê bi rêka makeqanûne ji bo ku hikûmetên peyhatî (peyrew) wan bişopînin û nekarin hilweşînin û bidin hilweşandin.

Xavier Albó

xalbo@entelnet.bo

www.cipca.org.bo Her wiha lê binêrin: www.unicef.org/bolivia/resources_2245.htm



Çêkirina Piran Navbeyn Zimanan di Perwerdeyê de

Hişyariya navneteweyî ya gîrîngiya Perwerde bo Herkesê zêdetir bûye. Lê belê, tenê rêka perwerdeya heyî bo piraniya cemaetên zimanên kêmnîneyî hêj jî tenê yek zimanî bi kar tîne ji bo hînkirina têgehnan ku hema bêje hîç eleqedar nînin bo jiyana xwendekaran a rojane ku pişka pitira wan vî zimanî qet fehm nakin an jî pê xeber nadin.

Rast e ku gelek kartêker (fakter) hene di serneketina perwerdeyê de, lê pir ron e ku heke xwendekar gotinên mamosteyên xwe fehm nekin, gelek zû ji xwendinê sar dibin. Kesên ji cemaetên xweyî zimanên kêmnîneyî zêdetir dev ji xwendinê berdidin, îhtimala wan a dubarekirina sinifê zêdetir e, rêjeya xwendewariyê kêmtir e û her wiha şansê wan jî kêmtir e bo peydakirin û dewamkirina karekî saxlem û dûvedirêj.

Her wiha, bikaranîna zimanên serdest di perwerdeyê de rê daye wundabûneke mezintir a ziman û kultûrên dinyayê. Texmînen dawî nîşan didin ku hema hema % 50'ê nêzîkî 7000 zimanên dinyayê metirsîdar in.

Ev gotar çarçoweyekê pêşkêş dike ku sistemeke yekzimanî veguhere ser yeke duzimanî an jî pirzimanî: Perwerdeya Pirzimanî li ser esasê zimanê dayikê.

Pêşqebûla perwerdeya pirzimanî ew e ku divê hemû xwendekar perwerdeya xwe bi wî zimanî bigirin ku herî baş fehm dikin û pê diaxivin. Bi vî awayî, xwendekar bi zimanê dayika xwe dest bi dibistanê bikin û dû re zimanekî din lê zêde bibe, rewana û şiyaweriyên zimanî bikemilîn bo danûstandin û hînbûnê di her du zimanan de.

Bi gîştî sê armancên bernameyên perwerdeya pirzimanî hene:

- Ziman:** pêkanîna rewana û xwebaweriyê bi bikaranîna zimanê xwe yê yekem (Z1) û zimanê duyem (Z2 û yê sêyem (Z3)) bo danûstandin û hînbûnê li dibistanê.


- Akademîk:** pêkanîna şiyaweriyê akademîk a hewce di her babetê de û amadekirina xwendekaran ku bikarin derbas bibin xwendina bilind a pirzimanî yan jî yekzimanî.

- Sosyo-kultûrî:** amadekirina derûdorekê ku xwendekar dîrok, ziman û kultûra xwe hez bikin û rêz bigirin bo wan û beşdariyê bikin di geşepêdan û pêşveçûna xelk û dewleta xwe de.

Xwendekar bi zimanê ku herî baş pê dizanin dest bi dibistanê dikin û vî zimanî bi kar tînin bo xwendewariya destpêkê di bernamêyên perwerdeya pîrzimanî de. Paşî, zimanê nû tê lêzêdekirin – ewil guhdarîkirin û axiftin, dû re xwendin û nivîsandin. Li rexekî xwendekar xwebawer dibin di bikaranîna zimanê fermî de bo danûstandinên rojane, li rexê din, peyvên nû û qalibên rêzimanî hîn dibin bo têgehên bêtir akademîk ên razber (soyut).

Em dikarin pênc merhaleyan destnîşan bikin ji bo ku pîrek çêbe navbeyna zimanan de di perwerdeya pîrzimanî de. Binêrin tabloya yekem.

Tablo: 1 **Modêleke Merheleyî bo Perwerdeyeke Duzimanî**





Li rexê din, wexta pêwîst be herî kêr bi sê zimanan perwerde bidin, perwerdeya ziman di asta dibistana seratafî de dê wekî tabloya duyem be.

Tablo: 2 **Modeleke Merheleyî ya Perwerdeyeke Pîrzimanî**

DIBISTANA MADER	SINIFA 1	SINIFA 2	SINIFA 3	SINIFA 4	SINIFA 5	SINIFA 6
<i>Pêşxistina şiyanweriyên deukî di Z1 de (zimanê dayikê)</i>	<i>Zimanê Perwerdê Z1</i>	<i>Dewama pêşxistina şiyanweriyên deukî û nivîskî di Z1 de</i>	<i>Dewama pêşxistina şiyanweriyên deukî û nivîskî di Z1 û Z2 de</i>	<i>Dewama pêşxistina şiyanweriyên deukî û nivîskî di Z1 û Z2 de</i>	<i>Dewama pêşxistina şiyanweriyên deukî û nivîskî di Z1 û Z2 de</i>	<i>Dewama pêşxistina şiyanweriyên deukî û nivîskî di Z1, Z2 û Z3 de</i>
	<i>Lêzêdekirina şiyanweriyên nivîskî di Z1 de</i>	<i>Pêşxistina şiyanweriyên deukî di Z2 de (zimanê duyem)</i>	<i>Lêzêdekirina şiyanweriyên nivîskî di Z2 de</i>	<i>Pêşxistina şiyanweriyên deukî di Z3 de (zimanê sêyem)</i>	<i>Lêzêdekirina şiyanweriyên nivîskî di Z3 de</i>	
<i>Zimanê Perwerdê Z1</i>	<i>Zimanê Perwerdê Z1</i>	<i>Zimanê Perwerdê Z1</i>	<i>Zimanê Perwerdê Z1 û Z2</i>	<i>Zimanê Perwerdê Z1 û Z2</i>	<i>Zimanê Perwerdê Z1 û Z2</i>	<i>Zimanê Perwerdê Z1 û Z2</i>

Bernameyên qewî û dûvedirêj ser esasa polîtîkayên ziman û perwerdeyê yên destxweş bi rê ve diçin ku:

- hemû zimanên li welatekî wekî saman û çavkaniyên girîng qebûl dikin,
- bikaranîna zimanê dayikê di perwerdeyê de jî di nav de, mafên siyasî, sosyo-kultûrî û zimanî yên axêverên zimanên kêrnîneyî qebûl dikin,
- rê nîşanî saziyan didin ku zimanên kêrnîneyî bi kar binin di perwerdeyê de,
- rê û rêçikan destnîşan dikin bo pêkhêneran ku bernameyên perwerdeya pîrzimanî bèn duristkirin û dewamkirin, pêşxistina zimanên hêj nenivîskî jî di nav de,
- dabîn dikin ku bernameyên perwerdeya pîrzimanî darayên (piştgiyariya pereyî) demdirêj wergirin ji hikumatan.

Susan Malone SIL International
Susan_Malone@SIL.org

Her wiha lê binêrin: Manual for Developing Literacy and Adult Education Programmes in Minority Language Communities, UNESCO: Bangkok, by Susan Malone, 2004
www.unescobkk.org/elib/publications/minoritylanguage/index.htm



Perwerdeya bi Zimanê Dayikê û Duzimanî li Efrîqayê

Perwerdeya ziman kêm caran bingeheke rêkûpêk dabîn dike ji bo çêtirbûna xwendewarî û qebiliyetên matematîkî li Efrîqayê. Li şûna ku bi zimanekî nasyar dest bi xwendina xwe bikin, zarok bi zimanekî navneteweyî perwerdeyê digirin beyî ku hêj duristî bi wî zimanî bizanin.

Lêkolîneke nû derheqê perwerdeya bi zimanê dayikê û duzimanîyê de, ku ji bo Dezgeha Pêşxistina Perwerdeyê li Efrîqayê û Enstîtûya Perwerdeyê ya UNESCO'yê hatiye birêvebirin, sedemên kêrnehatina sîstemên heyî destnîşan dike.

Bernameyên xwendewariya destpêkê tenê balê didin ser nivîsên asayî yê xwendinê, lê belê ji sinifa 4'ê pê ve li hêviyê ne ku xwendekar nivîsên têkeltir û yê akademîk bixwînin. Her wiha welatên efrîqayî li hêviyê ne ku zarok ji sinifa 1'ê pê ve an jî di nav 3-4 salên destpêka dibistanê de bi zimanekî navneteweyî hînî dersan bibin. Derbasbûna ji perwerdeya bi zimanê dayikê bo hînbûna bi rêka zimanekî navneteweyî gelek caran li qonaxekê wisa pêk tê ku xwendekaran mecbûr dikin ji xwendina çîrokên derbasî nivîsên akademîk bibin.


Li rexê din, xwendekar hewceyê şeş heta heşt salên hînbûneke qewî ya zimanê duyem in berî ku zimanê duyem wekî amrazê hînbûnê bi kar bînin. Di vê navbeynê de, divê perwerdeyê serûber a bi zimanê dayikê bê sepandin ku xwendekar bikarin dersan baş teqîb bikin. Çendî qebiliyetên di zimanê dayikê de qewî bin, şarezatiya di zimanê duyem de ew çend qewîtir dibe.

Lêkolîna Dezgeha Pêşxistina Perwerdeyê li Efrîqayê û Enstîtûya Perwerdeyê ya UNESCO destnîşan dike ku xwendekar baş diçin di destpêka bernamêyên bi zimanê dayikê de. Lê belê, bi derbasbûna zimanekî navneteweyî di nav 1- 2 salan de, serketin hêdî dibe û bi rêjeyeke % 30 dadikeve heta dumahîka sala dibistana seratayî.

Xwendekarên ku heta sinifa 6'ê li paş dimînin hema bêjin nikarin xwe bigehînin asta ku hewceyî pê heye. Sîstem tenê wan amade dîke bo wê yekê ku dest ji xwendinê bikêşin berî ku dibistanê xelas bikin. Tabloya jêr li Efrîqaya Başûr ferqa serketina di navbera xwendekarên ku bi zimanê duyem dersên xwe hîn bûne (%32) û yê bi zimanê xwe yê dayikê ew hîn bûne (% 69) nîşan dide.



Tablo: 3 **Efrîqaya Başûr – Sinifa 6'ê, Serketina Zimanî li gor Herêman**



Encamên lêkolînê:

- Pêşxistina xwendewariya zimanê yekem bo sinifên 1'ê heta 3'ê berketî ye lê têrê nake.
- Divê ji 6 salan heta 8 salan hînkirina zimanê duyem dewam bike berî ku zimanê duyem bibe zimanê perwerdeyê.
- Birrîna pêşwext a perwerdeya bi zimanê yekem her wiha rê li ber pêşveçûna hişî (kognîtîv) û akademîk jî digire.
- Serketina kêma di warên xwendewarî, matematîk û fenê de girêdayî pêşwext bikaranîna zimanê duyem wekî zimanê perwerdeyê ye.

Pêşniyar:

- Divê bername û materyalên nû werin amadekirin ku ferqa di navbeyna xwendewariya destpêkê (sinifa 1'ê heta 3'ê) û ya akademîk (ji sinifa 4'ê pê ve) de kêmîtir bike.
- Perwerdeya bi zimanê yekem were dirêjkerin, qet nebe heta sinifa 6'ê.
- Hemû mamoste werin perwerdekirin di warên pêşxistina xwendewarî û zimanî de.

Kathleen Heug

Konseya Lêkolînên Zanistên Beşerî, Efrîqaya Başûr
kheugh@hsrc.ac.za

Her wiha lê binêrin: *Optimizing Learning and Education in Africa – the Language Factor, A Stock-taking Research on Mother Tongue and Bilingual Education in Sub-Saharan Africa, Association for the Development of Education in Africa: Paris by Hassana Alidou et al, 2006 www.adeanet.org/biennial-2006/doc/document/B3_1_MTBLE_en.pdf*



Pirçeşnî û Politikayên Zimanî li Hîndîstanê

Hîndîstan mozaîka cihêrengiya zimanî ye. Ji 1,600 zimanên wî welatî, ku bi terzekî hinek keyfî di bin banê 114 cemaetan de berhev dibin, hîç yekê awayekî zelal ji yê din zêdetir nînin ji aliyê serhejmarê ve. Lê belê li gelek deveran zarok bi zimanên ku ne zimanê wan ê dayikê ne dest bi dibistanê dikin.

Zarokên ji cemaetên nezal (neserdest) ji her kesê zêdetir mexdûr in, ku Qebileyên Destnîşankirî, yê li cihên dûr dijîn, koçerên ji herêmên zimanê wan ê fermî cuda (bo nimûne zarokeke/i Maharashtra ji Gujarat) û yê li goşeyên bajarên mezin dijîn di nav de.

Meseleya ku kîjan ziman ji yê din baştir e ji bo perwerdeyê heta niha jî bûye aloziyeke mezin. Niha jî, ji her demê zêdetir meseleyeke girîng e di çarçoweya Perwerde bo Herkesê û pêxistina bidesxistin û qelîteya perwerdê de.

Piraniya herêmên xweser biryara zimanên perwerdeyê bo dibistanên seretayî bi tenê serê xwe didin. Hingî politikayên dewletê pêşniyar bike ku zimanê dayikê wek zimanê perwerdeyê bê bikaranîn jî, politikayên herêman diguherin ji ber kêmasiya rêberên birêvebirinê/sepandinê. Hinek herêm zimanê xwe yê fermî (wek Tamîl li Tamîl Nadu), û heta hingî diçe inglîzî, ferz dîke ser zimanê yekem ê axêveran.

Di pratîkê de ev tê çi maneyê?

Du reftarên giştî derdikevin:

- Di ya yekem de, mamoste tenê zimanê standard bi kar tînin û zimanên herêmî qedexê dikin di sinifê de.
- Di ya duyem de, zimanê dayikê bi rengekî nefermî tê bikaranîn – angû zimanê perwerdeyê yek e (bo numûne inglîzî li Jammu û Keşmîrê, û zimanê kitêbên dersê inglîzî ye) û mamoste hînkirin û îzahên xwe bi zimanê herêmî derdibin.

Di her du reftaran de jî xwendekar zorê didine xwe ku zimanekî nû hîn bibin li cihê ku divê têgehyan bi zimanekî ku ew pê dizanin. Hewlên bo pêxistina hîndekariyeke qewîtir lewma zehî dibin (fişe dibin) ji ber kêmasiya danûstendinê navbeyna xwendekar û perwerdeyê de.



Pêşniyar

Divê bernameyên din werin kifşkirin şûna bernameyên yekzimanîkirinê (xeniqandin). Divê modelên duzimanî bi rêyên jêrê bi baldarî bêne pêşxistin:

- Divê cemaetên zimanî û qebiliyetên zimanî yên zarokên ji pênc heta şeş salî bête destnîşankirin bi xerîtekirina sosyolengûstik
- Divê bi hişyarî dêhna xwe bidine cihêrengiya zimanî di pîlankirinên mehelî û yên herêmî de bo dabînkirina çavkaniyan
- Divê profilên zimanî yên xwendekaran, yên mamoste û zarokan jî nav de, bête amadekirin
- Ji bo ku pêwistiyên hatine destnîşankirin bête bidestxistin, divê stratejiyên mehelî ên perwerdeyê bête kifşkirin û birêvebirin, bername û modelên xurt ên duzimanîyê jî nav de.
- Divê bersivên nûger (innovative responses) bêne peyda kirin, bi rêya lêkolînên emelî (action research), ji bo cihê ku zarok xweyî du an zêdetir zimanan in.
- Divê mamosteyên ji herêmê bigirin û piştgîrî bidine wan ku şarezatiya hînkirinê bidest bixin
- Zorê bidin ku berpirsiyarên perwerdeyê, kesên pîlanên perwerdeyê dikêşin û perwerdekar têbigêhin girîngiya zimanê yekem ji bo pêşxistina hişî û hînbûna zimanên din ji xeynî zimanê yekem.
- Divê metodolojiyên hînkirineke qewî a zimanê yekem û yê duyem bêne dirustkirin û piştgîrî bidinê
- Divê qanûnan çêkin ku piştgîriyê bidin perwerdeya bi zimanên kêmnîneyî di dibistanan de li hemû herêmên xweser.

Hinek ji wan rêkan li herêmên xweser ên mîna Andre Pradeş û Orîssa têne ceribandin. Lê zehmetî ev e ku ev tedbîr pêkve bêne firehkirin û berbelavkirin ji bo berdewamiyeke demdirêj a pratîkên ziman-di-perwerdeyê de.

Dhir Jhingran

Midûriyeta Dibistana Seratayî, Wezareta Pêşxistina Çavkaniyên Beşerî, Hîndistan
djhingran@nic.in

Shireen Vakil Miller

Zarokan Biparêzin, Hîndistan
s.miller@scfukindia.org

Her wiha lê binêrin: Language Disadvantage: the Learning Challenge in Primary Education, APH Publishing Corporation: New Delhi, by Dhir Jhingran, 2005

Language and Education: Meeting the Needs of Linguistic Minorities in Delhi, unpublished dissertation, Institute of Education, University of London, by Shireen Miller, 2005